# PROGRAMA PARTİYA KOMUNİST YA TIRKİYÊ

TÜSTAV

WEŞEMÊN PKT

PROLETARÊN HEMÛ WELATAN YEKBIN!

TÜSTAV

**Herausgeber**
**ERMIS Verlag**
Postfach 101016
4300 ESSEN 1

**Offset Druckerei**
**B. Ronnes**
**4190 Kleve**

TÜSTAV

# PROGRAMA PARTİYA KOMUNİST YA TIRKİYÊ

**WEŞEMÊN PKT**

NAVEROK

DESTPÊK .......................... 7

KAREKTERA HEYMANA ME Û CİYÊ TIRKİYÊ L I HÜNDURÊ SİSTEMA EMPERYALİST .................. 12

TENTÊLA TIRKİYÊ ....................... 17

RÊYA RIZGARİYA NETEWİ Û CIVAKİ YA GELÊ TIRKİYÊ ........... 29

- Hırşandına diktatoriya faşist û damezırandına demokrasiya netewi .......... 29
- Demokrasiya netewi .................. 33
- Temamkırına şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel .................. 43
- Armanca meye sosyalist ............... 45

TÜSTAV

# Destpêk

**Damezırandına PKT û jêmayeyê devrıstandye**

Partiya Komunist ya Tırkiyê raste-rast bı tesira Şoreşa Gelarêzana Sosyalista Mezın,dı demeke rûyê erdê heymanek lap û nû,dı heymana jı kapitalizmê derbasbûna sosyalizmê vedıbû, lı Tırkiyê jı sıngê çina karker û gelê me damezıri ku ew têketıbûne şerê rızgariya netewi.

Dıji nirê kolonyalist,dıji dewletên biyaniyên êrişkar û dıji zorkariya Osmani şerê meye rızgariya netewi û hemû eneneyên bı şan ya şerên çini ku çina karkerê Tırkiyê dı gehina diroka xwe da domandiye,hemû jêmayeyên candi yên mırovparêz,gelparêz û pêşverû yên netewayê Tırk, û yên netewayê Kurd, û yên hemû netewayok û gelên hındıki ku lı Enetoli dıjin Partiya Komunist ya Tırkiyê dıde jiyandın.PKT partiya heri kevn ya welatê me ye û 10 Kewçerin 1920' an hatiye damezırandın.

PKT jı roja hatiye damezırandın vır va,lı nav şerên gelê me ya dıji emperyalizmê,paşverûtiya hundur û dıji karbıdestiya sermiya mezın û axayên axan,lı qorên pêşin cigırt; komunist dest bı çek tevbûne şerê rızgariya netewi.PKT,dıji zorkariyên bênavber û bıhoviti dombûne sekıni,mafên netewi yên gel,serxwebûna netewi,heq û azadiyên demokratikên gıştî,heqên cıvaki,abori yên mırovên xebatkar,karker,gundi,zıneetkar,memûr û yên hemû gel parast.

TÜSTAV

**Armanca nêzik û dûr ya PKT**

Bırojeki armanca bıngehin ya PKT jı navginek bûyina politika êrişkar ya emperyalizmê,û jı diktatoriya faşist ya oligarşiya hevkar,pêkanina demokrasiya netewi,baştırkırına mercên jiyina kedkıran, dawikırına zordestiya netewi lı welat û bılındkırına Tırkiyê bı faktoreki aşiti ye.

Armanca PKT ku qe nayê terıkandın sosyalizm e.Yekkırına çina karker û pıraniya gel ya Tırkiyê lı dora birbırına hane serbılınd û amadekırına wana bona şerê sosyalizm,hunduroka hemû xebatên politik yên PKT pêktinın.

PKT,partiya şoreşger ya çina karkerên Tırkiyê ye.Wezifa diroki ya çina karker bı rêya şoreşger dawikırına sazûmana kapitalist e ku ev sazûman xwe dısıpêre ser kedxwerına mırov bı destê mırovê dın,sazkırına sosyalizmê ye ku ew, yek cıvakek mırovparêz,datnas û demokratik e,û paşê ji sazkırına komunizmê ye.Çinakarker hıngê bıpêşengiya partiya xweye komunist xwe yekneke nıkare armanca xweye han pêkbine.

**Prensibên PKT**

Marksizm-Leninizma afırandiver ku dı heymana me yek zanistiyeka rasti zanyari û şoreşger e,û enternasyonala proleter prensiba rêberi ya hemû lıvinên PKT û bıngeha zanyariya politik ya wê ye.PKT dıji ideolojiya burcûwayi,dıji netewaperesti û şovenizmê dıji dıjkomunizm û dıjsovyetizmê,dıji oportonizma rast û "çep" tekoşineke ideolojiki bênavber dıdomine.

PKT qetek tevgera komunist ya navnetewani ye ku jê nayê qetandın; xebatkırına bênavber dı rêya yekitiya tevgera han da û şıriktiya wi bı hemû hêzên dıjemperyalist û aşiti wezifa partiyê ye.Yekitiya bıbırati bı Partiya Komunist ya Yekitiya Sovyetan (PKYS) ku ew pêşeng û sıparteka bıngehina tevgera komunist ya navnetewani ye,pışgıriya bı hemû welatên sosyalizma reel berê pêşin Yekitiya Sovyetan,prensiba bıngehina enternasyonalisti ya PKT ye.



PKT pışgıri bı şerên rızgariya netewi yên gelên Asya Afriqa û Emeriqa Latini ra dıdomine.PKT tevayiya vi, heqa bıazadi kıfşkırına qedera xwe ya netewanan,heqa cıhêbûnê bê tawiz dıparêze.

Damezırandiver û serokê gıştiya pêşin ya PKT Mıstefa Suphi,bı hemû jiyina xwe bû wekoka mezın ya enternasyonalisti û welatpareziyê.Ew dı qorên Bolşevikan da dıji neyarên şoreş şerkır,dı rêya rızgariya netewi û cıvaki ya gelê me da canê xwe da.

PKT jı xeta Mıstefa Suphi neqetiya,naqete.

PKT dı rêya enternasyonalizma proleter da dımeşe.Lı rêya han wezifên çina karker û wezifên netewi yên gelê Tırkiyê bı wezifên muşterek yên çina karker û hêzên pêşveçûna cıvakiyên navnetewani; berpırsiyariya partiyê yên pêşiya çina karkerên welatê xwe bı berpırsiyariya pêşiya karkerên hemû welatan va hevidu gırêdıde.

***

**Dı şerê rızgariya netewi da**

Programa hane lı Kongra 5'an ya PKT hatiye bıryarkırın Programa 4'an ya PKT ye.

Programa Yekan ya PKT wezifên serfırazkırına şerê rızgariya netewi û damezırandına komerek demokratik hıldıda hundurê xwe.Dı salên 1919-1923 şerê rızgariya netewi serfırazbû.Hêzên rızgariya netewi Padişatiya Osmani û Xelıfetiyê paqışkırın avêtın. Komera Tırkiyê ya civan û serbıxwe hate damezırandın. Bı vi avayi beşeki armancên bı Programa Yekan danibûne pêşiyê hate pêkanin.

**Dı tekoşina paraztına serxwebûnê da**

Programa Dudan ya PKT gori mercên nû, kû burcûwaziya netewi lı ser dewletê karbıdest bubû hate amadekırın.Programa 1926'an,hûrındarkırına wezifên şoreşa rızgariya netewi kû lı nivê rê mane,bı şoreşa demokratika dıjemperyalist,dıjfeodal

û wezifên şerê dıji hemû awayiyên têketınên rêya vegerina gırêdayibûyina emperyalizmê û mercên kapitûlasyonê hıldıda hundurê xwe.Programa Dudan dı mercên lı welatên kapitalist faşizm bubû xeteriyek mezın û emperyalist tıvdarekên şereki cihanê nû dıditın êdi nıkarıbû hevcedariyên tevgerê bersıvbıke.Kongra 4'an ya Partiyê ku dı sala 1932 hatıbû pêkanin guhırandına Programa Dudan bıryarkır.

**Dıji faşizm û şer**

PKT,lı beriya Şera Cihanê ya Dudan û dı dema salên şer da hemberê zordestiyên gıran sekıni.Parti dıji hukumetên aligırê faşizmê ku dıxwestın Tırkiyê lı rex Almanya Nazi kaşbıkıne hundurê şer,û dıji tevgera nejadperest-faşist ya ajanên Nazi tekoşin da.Dıji kapitalistên talankır yên şer mafên karkeran parast.PKT,dı Plenuma Komita Navçayi ya xwe da lı sala 1943 dıji faşizm û talankırınê platforma eniyek fıre bıryarkır.Komunist û hemû hêzên dıjfaşist,dı pındamkırına Tırkiye lı rex Almanya Nazi kaşbıbe hundurê şer roleke gırıng leyistın.

**Bona demokrasi**

Dı dema paşiya şer PKT xebıti şıriktiya hemû hêzên demokratik pêkbine ku rejima bı yek parti were dawikırın,azadiyên demokratik yên gışti werın qezeçkırın,aşiti û serxwebûniya netewi were paraztın,reforma ax were pêkanin.Lı cihanê û lı Tırkiyê dı mercên hatıbûn guhırin,Programa Partiya Kedkır û Gundiyên Sosyalist ya Tırkiyê ku dı sala 1946'an bılegali hatıbû sazkırın,armancên politik yên roje ya PKT dıteyisand.Paşiya 1950,bı vê yekê ku karin derbasbû destê burcûwaziya mezın ku ew dı bıngema emperyalizma Emeriqa'yê da bûn, dı mercên emperyalizm "şerê sar" nepaxdıkır,lı welat rejimek zordestiyê neyarê gel hate damezırandın.Dıji PKT ku hemberê politika neyarê gel ya hukumetê û hemberê şerê Kore'yê têketıbû tekoşinê,êrişek heya wi rojê nehatıbû ditın destpêkır.

**Qelsiyên derbase dı beriya pêngavê da**

Dı dema 1950-1960'ê da jı sedema gırtınên gıran dı xebata partiyê da qelsiyên derbase eşkerebûn.Jı vê sedemê PKT nıkarıbû mercên kêrhati ku bı wergerandına 27 Gulan 1960 peydabubûn bıemıline.

PKT lı hundurê salên 1960-1970,bona amadekırına programek lêhati bı teybetiyên nû dı geşbûna kapitalizm lı Tırkiyê û bı pêpılûka nû dı buxrana kapitalizmê û lı ser bıngeha han bona pêkanina yekitiya kadroyên partiyê ya ideolojik û politik xebıti.PKT, Partiya Karkerên Tırkiyê (TİP) ku lı sala 1961 hate damezırandın pıştekkır û xiretên rêberiyê bona dı eniyek da yekbûna hêzên dıjemperyalist û demokrat nişankır.Parti xiretkır qelsiyên hundurê xebatên xwe bıqedine.

**Dema pêngavê**

Bıryarên ku PKT lı sala 1973 bıryarkır dı diroka partiyê da demek nû da destpêkırın.dema han bı hemû aliyan va dema pêngavek nû,salên lıvinê bû.Wezifa bıryarkırına programa nû ya partiyê,dı sala 1977'a da Konferansa Netewi ya partiyê ani ci.Programa Partiyê ya Sısêyan jı aliyê dı ronayiya Marksizm-Leninizm lêkolina heymana me û mercên cıvaki-abori yên Tırkiyê û jı aliyê armancên dûr û nêzik ku jı vır derxıstye,bıgıştî hêjayiya xwe dıparêze.

**Tentêla nû, programa nû**

Lê belê dı dema derbasbûyi da lı cihanê û lı Tırkiyê guhırinên gırıng eşkerebûn.Emperyelizm berê xwe da teverkırına nermbûna kolana navnetewani, politika hışkbûn û hevxıstınê derxıste pêş.Encama vi lı rûberê cihanê xetetiya şereki nukleer pır gelek zêdebû.Lı Tırkiyê bı pıştekiya emperyalizma Emeriqa'yê diktatoriyek faşist hate damezırandın.Geşbûnên han wezifên damezırandına hevkariya fıre bı hemû hêzên aşitiparêz û hemberiyên diktatoriyê,bılındkırına tekoşina koman diveyahkırın strateji û taktikên partiyê nû va werın rêzkırın. Kongra 5'an ya PKT bı geşkırına Programa Sısêyan,gori tentêla nû wezifa han ani ci.

## Karaktera heymana me û ciyê Tırkiyê lı hundurê sistema emperyalist

**Lı rûberê cihanê heymana jı kapitalizm derbasbûna sosyalizmê**

Heymana em têda dıjin ku bı Şoreşa Gelarêzana Sosyalista Mezın destpêkırye, heymana lı rûberê cihanê jı kapitalizm derbasbûna sosyalizmê ye. Dı heymana me da dıjitiya bıngehin dı navbera kapitalizm û sosyalizmê da ye. Bergeha bıngehin ya geşbûna gerdûni sistema sosyalista cihanê, berê peşin Yekitiya Sovyetan kıfşdıke. Çina karkerên welatên kapitalist û tevgera rızgariya netewi lı cem sistema sosyalista cihanê hêzên bıngehin yên tekoşina hemberê emperyalizmê pêktinın, gehineka şoreşgeri ya cihanê pêşvadıbın.

Lı rojên me welatên sosyalist geşbûyinên xweyên bı pır bergeh dıdominın, welatên dın pey hev dıkevıne rêya geşbûyina sosyalist. Lı welatên kapitalist tesira çina karker lı ser geşbûna cıvaki zêdedıbe,dıgel hevkarên xwe,tekoşina dıji karbıdestiya yekdestan bılınddıke. Gelên Asya,Afriqa û Emeriqa Latini, dı tekoşina dıjemperyalist da qezencên nû peydadıkın. Hunduroka dıjemperyalist ya tevgera welatên bêbloq kûrdıbe. Kolanê tesirê ya emperyalizmê tengdıbe.

**Buxrana kapitalizm û politika êrişkar ya emperyalizmê**

Buxrana gıştı ya kapitalizmê kûrdıbe,bı buxranên dewri va derbasê hundurê hev dıbın.Bêistiqrariyên hundurê sistema kapitalizmê zêdedıbın.Dıjitiyên navbera emperyalistan tûjdıbın. Hıngê emperyalizm qelsdıbe êrişkariya wi hê ji zêdedıbe.Emperyalizma Dewletên Yekbûyi yên Emeriqa serê paşverûtiya navnetewani dıkşine, bı armanca para zıvırandına çûyina dirokê stratejiya xweye êrişkar bergehdıke ser welatên sosyalist berê pêşin ser Yekitiya Sovyetan û ser hemû hêzên dıjemperyalistên cihanê.

Dorhêlên karbıdest ya DYE (Dewletên Yekbûyi yên Emeriqa) bı armanca qezençkırına bıhêzbûna leşkeri lı hemberê welatên sosyalist qoşa bıçekbûnê qasê heya nıha nediti lezdıkın. NATO dı tıvdarekên lı cihanê şereki nû da rola pêşin dıleyize.Têketınên emperyalizma DYE ku armancdıkın keysa derba nukleer ya ewılin derbasbıke destê wi, xeteriya tunebûna mırovatiyê dı şerê nukleer da zêdedıke.

Îro lı cihana me tu qıte û tu hêram tune,ku emperyalizma DYE bona pêkanina guhırandınek bı kêra mafên xwe zorkari,gefan û zorbeti neemıline. Emperyalizma DYE hêrama Rojhılatanavin ji, bona xwe kolana mafên jiyini dıhesibine û bona pındamkırına geşbûnên dıjemperyalist, lı vi hêramê hemû rêyan dıemıline.

**Tırkiye: welatek gırêdayi bı emperyelizmê**

Tırkiye qeteki sistema kapitalisti ya cihanê ye û welatek jı aliyê abori,politik û leşkeri bı emperyalizmê gırêdayi ye. Jı vi sedemê rasterast dı bın tesira encamên gıran yên cıvaki,abori û politik yên buxrana gıştı ku hıngê dıçe kûrdıbe ya sistema kapitalisti ya cihanê da dımine. Lı cem vi, Tırkiye lı pêşberê encamên bı xeteriyên hemû cûre serboriyên leşkeri yên emperyalizmê dımine ku emperyalizm kudera cihanê dıbe bıla be têdıkevê.

Tırkiye ku bı alikariya mezın ya welata sosyalista pêşin, bı alikariya Urısya Sovyet, bı rêya jı şerên rızgariya netewi yek dıji emperyalizmê yên pêşin lı rûyê erdê gıhiştande serfıraziyê û hatiye damezırandın. Dostiya Tırk û Sovyet bûye yek jı prensibên berê pêşin dı politika der ya Komera Tırkiya civan da.



HÜSTAV

Lı paşiya Şerê Cihanê ya Dudan emperyalizm, nemaze emperyalizma DYE bı azinên kolonyalizma-nû ku ew bı "Doktrina Truman" û bı "Plana Marshal" kesdardıbın, xwe sıpartande hêzên paşverûyên hundur, burcûwaziya mezın, xwedanên axên mezın û burcûwaziya burokratik, lı ser Tırkiyê karbıdesti peydakır. Tırkiye bı endamiya NATO bû welatek gırêdayi, û bı rêzek peymanên dilitiyên duali bû welatek gırêdayi bı DYE û welatek peyrevok.

Jı sedema cigırtına xweye coxrafiki ya stratejik,lı hêram Tırkiye dı planên şer yên NATO û emperyalizma DYE da ciyek gırıng dıgre. Tırkiye ku welatê endamê NATO ye ku xwedanê tuxuba heri dırêj bı Yekitiya Sovyetan e, lı cem vi dı navbera Belqanê, Behraqerqaşa Rojhılat û Rojhılatanêzik da nıqta gıllê ye. Emperyalist ev cigırtına stratejik ya Tırkiyê hım lı pêşberê Yekitiya Sovyetan, hım pêşberê welatên sosyalist yên lı Belqanê, hım ji lı pêşberê tevgerên rızgariya netewi yên lı Rojhılatanavin weka texteki banzdayinê dıbinın. Hebûna gelek wergehên NATO û Emeriqa lı ser erdê Tırkiyê, ewi dı pêşberê hemû welatên cinar dıke faktorek gefê û welatê me tine pêşiya xeteriyê ku ew bûbe meydana şerê nukleer.

Politika abori ya welat, avagehên dıravi yên emperyalistên kolonyalistên-nû, weka IMF û Banqa Cihanê dıdın nıvisandın.Yekdestên navnetewani hıngê dıçe zêdetır dıkevıne hundurê abori.Welatên emperyalist bı navginiya CAA (Cıvata Abori ya Awrupayi) dıxebıtın pêgırêdayina kolonyalistiya-nû ya Tırkiyê zêdetır bışidinın.

Emperyalist, nemaze emperyalizma Emeriqa'yê, bona bıhêzkırına ciyên xwe lı welatê me hemû rêyan dıcerıbinın. Emperyalistên dı dirokê da bı zordestiyên bı pırali lı hemû kolanan, jı damezırandına hukumetan heya politika der tevdıbûne şıxwılên meyên navin, hukumetên hevkar û burcûwa pıştekdıkırın ku ev bıhoviti heqên mırovi yên heri bıngehin pêpeskırıne, dıji tevgera gel ya dıjemperyalist demokratik terorizmê rapelıkandın,mudaxele û wergerandınên leşkeriyên paşverû nepaxdıkırın, iro ji bona mafên xweyên kajo, diktatoriya faşist pıştekdıkın. Dı êrişên wiyên dıji gel, dıji hêzên aşiti û demokrasi da wi bıwerindıkın.

Cebılxana erişa ideolojik ya oligarşiya hevkar, jı çekên êrişiyên dıjkomunisti û dıjsovyeti yên emperyalizm û ji şovenizm pêktê. Çekên han ne tenê dıji komunistan ku 1922'an vır va mecbûr bûne nepeni dıxebıtın, lê dıji hemû hêzên aşitiparêz û demokrat bêeman têne emılandın. Oligarşiya hevkar û diktatoriya wi ya faşist, nermbûna navnetewani weka xeteriyek bona hebûna xwe dıbine.

**Tırkiye: Xeleqa qels ya emperyalizmê**

Pêşberê van hemûyan, Tırkiye xeleqa qels ya emperyalizmê ye. Bona rızgariya netewi û cıvaki ya gelê Tırkiyê, mercên navnetewani kêrhati nın. Pêvendiya hêzan ya hemberê hev lı cihanê, hemberê ne serkeftın û mexlûbiyetên derbase ku lı vır û lı wır eşkeredıbın, tımi lı bergeha mafên hêzên dıjemperyalist dıguhıre. Serkeftınên sistema sosyalist kedkırên welatê me şoreşgerdıke, dı nav tekoşina wi da bona gelê Tırkiyê ronayi dıgre.

**YKSS: Kela aşitiyê**

Jı Şerê Cihanê ya Dudan vır va nehatına şereki cihanê ya nû lı pêşiya mırovatiyê, hemû gavên ku lı rêya nermbûnê dı pêvendiyên navbera dewletan û lı rêya bêçekbûnê hatıne avêtın, berê pêşin afırandına politika aşiti ya bıbıryari ya Yekitiya Sovyetan û hêza wiya mezın dı hemû kolanan, abori,politik,leşkeri ye.Dı sistema sosyalist da ku kela aşitiyê ye çin, dorhêl û hêzên politik tune ku mafên wan jı şer, jı tıvdarekên şer, jı qoşa bıçekbûnê û jı wegırvani hebın. Aşiti pêwıstiya tebieta sosyalizmê ye.

**Lı cem hev jiyina bı aşiti**

Lı cem hev jiyina bı aşiti cûreki tekoşina çini ya navnetewani ye ku

dıdome. Lı cem hev jiyina bıaşiti sistemên cıvakiyên dıjihev eve ku lıhevnehatınên dewletan neemılandına zordari û gefa zordari were hûrındarkırın, pêşiya karbıdesti û gışkiya ax, wekheviya dewletan gıram were nişankırın û tevnebıne şıxwılên navin yên hev. Armanca tekoşinê bona bêkêmayi pêkanina prensibên han, derxıstın û avêtına şer jı jiyina mırovatiyê ye. Lı cem hev jiyina bıaşiti tekoşina gelên dı bın zordestiya emperyalizmê da ne û kedkırên welatên kapitalist bona rızgariya wan bıhêzdıke. Hêzên heri paşverû yên emperyalizmê qelsdıke. Mercên navnetewaniyên kêrhati, bona baştır isbatkırına serdestiya sosyalizmê lı pêşberê kapitalizmê dıde gihiştandın.

**Wezifa heri gırıng: Paraztına aşitiya cihanê**

Eslê emperyalizmê neguhıri. Ew iro ji weka do neyarê pêşin ya mırovatiyê ye, disa kaniya kedxwerın,zordesti, newekhevi û xeteriya şer e. Lı roja iroyin wezifa heri gırıng, lı kolana navnetewani paraztına aşitiyê ye. Komunistên ku dı tekoşina dıji kedxwerın û zordestiyê da lı qorên heri pêşin cidıgrın, bona paraztına heqê heri bıngehin ya mırovan,heqê jiyinê ji dı qorên heri pêşin ya tekoşina aşitiyê da cidıgrın. Bona hevsarkırına êrişkariya emperyalistan, bona bıhêzkırına yekiti û pışgıriya welatên sosyalist, tevgera karkeran ya navnetewani, tevgera rızgariya netewi û hemû hêzên dıji şer, bona aşiti hemû xiretan nişandıkın. Tekoşina lı rêya aşiti, jı tekoşina dıji emperyalizmê û jı tekoşina demokrasi, pêşveçûna cıvaki nayê veqetandın.



## Tentêla Tırkiyê

**Kapitalizma gırêdayi û bınısbeti paramayi**

Sedema bıngehin ya vê yekê ku Tırkiye hemberê hemû keysên xwe, bı deh salane jı paramayin û jı buxranên kûr nıkare xwe rızgarbıke kapitalizma gırêdayi bı emperyalizmê ye ku lı welat cigırtiye.İro Tırkiye lı hundurê sistema kapitalist ya cihanê welatek çandın û senayi ye, û lı hundurê welatên kapitalistên bı dereca navin geşbûyi lı rêzên jêrin cidıgre.Karektera bıngehin ya kapitalizma Tırkiyê, bı pırali gırêdayibûna emperyalizmê û bınısbeti paramayina wi ye.

**Geşbûna kapitalist lı Tırkiyê**

Kapitalizm lı Tırkiyê dema Osmaniyê bınisbeti dereng û tevlıhev destpêkıre geşbûnê; bı "dewletgeri" ya abori ku lı salên 1930'yan destpêkırın bıkaranin cigırt.Ça lı paş Şerê Cihanê ya Dudan pêvendiyên kapitalist ku emperyalizm bı azinên kolonyalizma-nû pıştekdıkır, ketın hundurê geşbûnek lez; kavılên feodal destpêkırın tunebûnê; bazara hundur fırebû; hêzen berkır lı hınek sektoran geşbûnek bınısbeti lez nişankırın; lı gelek çıqan berkırın zêdebû; kapitalizm lı çandınê ji karbıdestbû. Dı salên 1970'yan da : berkırına senayi jı çandın buhuri, çıqên nû dameziri; cûreyên berkırınê pırbûn; sektora olaman mezınbûn û fırebûne-

ke lez nişankırın; nıfûsa bajari gihişte nıfûsa gundan; hejmara xebatkarên senayi û sektorên inşaat, pêgihandın û olamê tev bıhevra gihişte 40 jı %' ên nıfûsa bıabori aktif. Tıbaba kesên ku dı çandınê da bı derheqdest dıxebıtın lezi zêdebû.Sistema sosyalist ya cihanê lı ser van geşbûnan tesirên bıwesite û bêwesite nişankır.Tırkiyê va pêvendiyên aboriyên bı heqên wekhev û bı duali kêrhati damezırand.

**Sermaya yekdest û pêvendiyên kapitalizma yekdestiya dewlet**

İro, burcûwaziya yekdestê hevkar, lı serê vi 8-10 grubên yekdest dı pelandına abori da xwedanê hêzek gırıng e. Derbasê nav hevdu bûyina grubên yekdest bı banqeyên teybeti, dendıkê finans kapital damezıri. pêvendiyên teybeti yên kapitalizma yekdesti ya dewletê bıgırêdayi geşdıbın, gehineka derbasê nav hev bûyina dewlet û yekdestan pêşvadıçe.

**Encamên cıvaki, abori û politik ya kapitalizmê**

Guhırinên hane dı aboriya Tırkiyê da mercên pêwıst bona bıhêzbûna tevgera çina karker û bıngeha cıvaki û abori ya sosyalizmê amadedıke.Jı aliyê dın wextê çengek bavêdıravan hıngê dıçe dewlementırdıbın, pıraniya mezın ya nıfûsê ji xızantırdıbın.Kedxwerına ser çina karker gûrdıbe. Gûriya kedê bızordesti tête zêdekırın.Keda karkerên jın û civan, keda karkerên çandın û rêlê bıhoviti tê xwerın.

Tentêla berkırên pıçûk lı bajar û gund, û tentêla tebeqeyên navin xırabdıbe.Tentêla gelek kapitalistên xwedanên kargehên pıçûk û navin dıheje.

Bêşıxwıli wek pırsiyara cıvakiya heri mezın derdıkeve pêş. Enflasyon û tımi zêdebûna cılman, bêwezıntiyên belabûna dıhatoka netewi hê ji kûrdıke. Seviya pêkanina hevcedariyên cıvaki û çandeyi, weka xani,bıjunti û hinandın ya karkeran paradıçe. Geşbûna zanist, pişi û çande, gihiştandına van bı gel dıjwardıbe.

Geşbûna kapitalist ya gırêdayi rê vêkır welatê me pırtır bı emperyalizmê gırêbıbe û paşverûti lı her kolanê pêştahere. Hêzên karbıdest heqên demokratik ya gel bıhoviti pêpesdıkın. Gehineka kombûna sermayê lı çend destan, zordesti û zorbetiya hê ji zêdetır dıji çina karker û hemû kedkıran,dıji gelê Kurd û dıji hêzên pêşverû seranser dıçe.

**Aboriya bı pır avayi**

Aboriya Tırkiyê karekterek bı pır avayi nişandıke.Abori pêvendiyên berkırınê ya teybetiyên beriya kapitalizmê û pêpılûkên kapitalizmê yên ewılin, geşbûyi û axırin, lı cem hev dı hundurê xwe da xweyidıke.

Geşbûna kapitalizmê, dı çandın, dı bazırgani, û dı şıxwılên dıravi da, pêvendiyên beriya kapitalizmê û nivfeodal û berkırına pıçûk ya metayên belabûyi dawinekır ku cûreyên hevkari, nivekari, selefkari û debıri têne dıtın. Her çıqas gırıngiya pêvendiyên han kêmdıbe ji hebûna wan dıdome.

İro mılkên mezın bı pıraniya mezın bı destê xwediyên xwe, yan ji bı destê kırêkıran, bı pêvendiyên kapitalist têne xebıtandın. Hejmara cotgehên kapitalist ku bı axıriya derbasê destê xwe kırın,bı kırêkırına axên gundiyên pıçûk û bı yekkırına van hatıne damezırandın zêdedıbe. Zıvırandına axên mezın bı kargehên kapitalist ku ew bı serûber karkerên bıderheqdest dıxebıtinın, gehinekek dırêj û bı sanci ye.

Berkırvanên pıçûk ku lı hundurê nıfûsa xebatkarên çandınê pırani ne, hıngê dıçe dıhırşın. Lê berkırına pıçûk lı çandınê hê ji fıre ye û gırıngiya xweye mezın dıparêze.

Berkırına pıçûk ne tenê lı çandınê, lı senayi ji ciyeke gırıng dıgre.Pıraniya gıran ya kargehên kapitalist lı Tırkiyê jı kargehan pêktê ku hındık karker dıxebıtinın û teknolojiya paramayi dıemılinın. Bı geşbûna kapitalizmê e-

vana jı aliyek dıhırşın, jı aliyê dın va nû yên van dızên. Kargehên senayiya berkırınê yên modern, dı bın xwedaniya sektora kapitalistiya teybet da nın ji, gora pivên hevdemi babetiyên para nişandıkın. Teknolojiya van paramayi ye,bı derva va gıredayi ye. Bendên hıldan-dayinê dı navbera kargehên senayiyên mezın da qels e, berkırına navginên berkırınê lı seviyek pır para ye.

Lı Tırkiyê bıra bıngehin yên berkırına malên razandın û malên navin kargehên dewlet pêktinın.Dewlet bı kargeh û bı navginên xweyên dınên bın destê xwe dı senayi, çandın, benqekari û bazırganiyê da roleke bergehkır dıleyize. Hevgırtına bınısbeti navbera avayiyên cûda cûda dı aboriyê da ancax bı feeliyeta bıserûberkırını ya dewletê têye peydakırın.Peydakırına hevgırtına han roj bı roj dıjwartır dıbe.

Bı lezbûna gehineka yekdestbûne, ev yek ku yekdest berê pêşin bı navginiya karina politik keysên maddiyên bıhêz yên kapitalizma dewletê bona mafên xwe pırtır dıemılının û hevkariya xwe bı sermaya biyani va bıhêztır dıkın, dıjiti, bênısbeti û buxranên kapitalizma gırêdayi û paramayi hê ji zêdetır dıke.

Bı emperyalizmê gırêdayibûn, kedxwerın û talana gıran ya emperyalisti buxrana abori kûrdıke. Tırkiye tımi lı tentêla hevcedariya qrediyên welatên emperyalist dımine. Dewletên emperyalist û komelên kollektif yên kolonyalizma-nû, weka İMF, Banqa Cihanê bona qrediyên dıdıne Tırkiyê, hım faizên bılınd dıdıne sıpartın, hım ji lı pêşberê vana tavizên abori û politikên mezın dıstinın. Deynên der tımi mezındıbın. Yekdestên navnetewani jı razandınên xweyên bıwesite û bêwesite lı Tırkiyê karên mezın peydadıkın. Bı pêkaninên politikayên abori ku İMF dıde sıpartın, bı derva gırêdayibûna aboriyê hê ji zêdedıbe,Buhayên malên itxalatê hê ji bılındıbın. Pêşberê vi buhayên malên ixracatê ji tımi berjêrdıbın. Ev kedxwerına emperyalizmê lı kolana bazırganiyê bı develuasyonên İMF dıde sıpartın hê ji zêdedıbe. Deyndarmayina dı bazırganiya der da, jı Şerê Cihanê ya Dudan vır va bû



pırsiyareke qronik. Ev yek ku NATO xerçkırınên bıçekbûnê zêdedıke bona wındabûna fonên netewiyên pır mezın rêvêdıke.Peymanên hukumetên Tırkiyê bı CAA pêkaniye zırarê gelê me û aboriya netewi dıxebıtın.

**Buxrana avayi**

Aboriya Tırkiye dı hundurê buxraneke bıavayi ya tımi da ye.Dı bıngeha buxrana han da ku daviya 1975'an encamên wê yên hırşanındınox hê ji kûrbûne, karektera bı pır avayiya abori radızê. Ev avayiya abori, geşbûna hêzên berkırınê dijwardıke, gırêbûna bı emperyalizmê zêdedıke, lı gehineka berkırınê tımi bona asêbûnan rêvedıke. Navbera senayi û çandınê, navbera çıqên cûre cûre yên senayi, navbera hêramên coxrafik, navbera berkırına malên berkırınê û qedandınê (tüketim), û bı gıştı navbera berkırın û qedandınê bêwezıniyên mezın û wezıniyên newekhev yên geşbûnê derdıkeve holê. Qereborse,spekulasyon,qaçaxi, ruşwet, şêlandın bılezi beladıbe.Newekheviyên cıvaki, cıhêbûnên çini kûrdıbın.

Her çıqas dı hınek nişandanoxên buxranê da başbûnên bınısbeti û derbase were ditın ji,geşbûna heya iroyin eşkere bıdelilkırye kapitalizm lı Tırkiyê nıkare bı pır avayiya aboriyê û buxrana avayi jı holê rake.Hıngê guhırandınên dıjemperyalist û demokratikên bıngehin neyên pêkanin,buxrana han nayê dawikırın.

**Burcûwaziya yekdesta hevkar**

Lı Tırkiyê bona emperyalizm û paşverûtiya hundur pışteka cıvakiçini ya heri gırıng burcûwaziya mezına hevkar, nemaze ji bıra wê ya yekdest e. Burcûwaziya yekdest ku hebûn û hêza xwe jı berê hemû tıştan deyndarê emperyalizm û pıştekê dewletê ye,lı hundurê burcûwaziya mezın bıra heri honandi, heri jir ku heri lez bıhêzdıbe,bıra heri mêjokkar û heri paşverû ye.

Burcûwaziya yekdesta hevkar hındıkayiyek pıçûk e ku berê pêşin xwe bı teherê holdingan honandiye, lı sektorên senayi, bazırgani û olami pır gelek kargehan lı

bın xwedaniya xwe dıgre, dı hınek çıqan da bı rêyên cûre cûre kargehên pıçûk bı xwe va gırêdaye.Hındıkayiya han hım keda karkerên kargehên xwe dıxwe, hım ji hemû bırên der-yekdest dışêline, karên mezın ya yekdestiyê derbasê destê xwe dıke.Çend holding hemû banqe û şırketên sigorteyên teybet derbasê bın destê xwe kırıne.

Bı pêkanina politikayên abori ku İMF dıde sıpartın zırarê hemû bırên dın burcûwaziya yekdest hê ji bıhêzbû, mejokkari, spekulatori û karektera wêya şêlandiveri kıfştır derkete ber çewan. Ew xwe qewimtır bı emperyalizmê gırêda,paşverûtırbû.dı refên wê da meylên faşist, şovenist, wegıvan, parêzdarê hışkbûnê û serborivan bıhêzbûn,hıngê çû derketıne pêş.

**Burcûwaziya burokratik**

Burcûwaziya burokratik ku jı bıra bılınd ya burokrasiya dewlet derdıkeve, bı xılmetkırına ciyên xwe dı dengbariyan û kargehên dewlet da dıbıne xwedanê sermayê, bı yekdestên teybet pêvendiyên bıwesite û bêwesite dıdamezırinın, bı navginiya İMF, Banqa Cihanê, Kluba Rotary hwd. xwe bı dorhêlên emperyalist gırêdıdın,

Bıra bılınd ya ordi bı OYAK (Avageha Hevpıştekkırına Ordi) û bı Weqıfên Ordi bûne xwedanê pıştekên abori yên teybet,bı gelek rêyan bı yekdestên teybet bendan damezırandıne.Bıra han paşiya 12 Kewçerin 1980 bendên han û hêza xweyên abori hê ji zêdekırye. Ev bı pêvendiyên xweyên bêwesite bı Pentagon,bı NATO û bı yekdestên çekberkır, bı emperyalizm, nemaze ji bı emperyalizma DYE va gıredayi ye.Pêvendiyên han wê paşverûtırdıke.

**Burcûwaziya navdar û şêlandiver**

Burcûvaziya navdar û şêlandiver ku rêya bı qereborse, spekulasyon, selefkari, qaçaxi, mıtehitiya dewlet û ordiyê, bı rêyên zagûni û der-zagûni karên mezın lêdıde, bı gelek rêyên bıwesite û bêwesite bı dorhêlên emperyalist, bı burcûwaziya yekdesta hevkar, bı burcûwaziya



burokratik û bı rêbırına bılınd ya ordiyê pêvendiyan dıdomine

**Xwedanên axên mezın**

Xwedanên axên mezın bırek teybet ya hêzên karbıdest pêktinın.Bıra han lı kolana der-bajaran hêza heri paşverû ye.Jı damezırandına Komer vır va her çıqas bınısbeti kêmbûye ji, lı hemû deman lı ser karina politik bûye xwedanê tesirek gırıng.

**Oligarşiya hevkar**

İro lı Tırkiyê karbıdestiya abori û dewletê oligarşiya hevkar dı bın destê xwe da dıgre.Oligarşiya hevkar, jı burcûwaziya yekdesta hevkar, û jı heri kodamanên burcûwaziya şêlandiver-navdar, burcûwaziya mezına hevkar, yên xwedanên axên mezın, yên burcûwaziya burokratik ku lı dora burcûwaziya yekdesta hevkar aliyane hev, jı rêbırına bılınd ya ordiyê û jı neminentên emperyalizma Emeriqa yên lı welat pêktê.Bırên han pêşberê hınek dıjitiyên hundurê xwe, dıji gel û dıji mafên wiye netewi pıhêt bı hev gırêbûne.

**Cûdabûna hundurê burcûwazi**

Cûdabûna hundurê burcûwazi ji zêdedıbe. Mafên xwedanê kargehên pıçûk û navin, berê pêşin yên lı senayiyê feeliyet dıdominın û bı emperyalizm û yekdestan gırêdayi ninın, mafên burcûwaziya gund bı mafên oligarşiya hevkar tê hemberê hev, ciyên vane abori paradıçe. Ev bıra burcûwazi dı tekoşina aşiti û demokrasiya netewi da bı çina karker şırikti bıke kêra wê bıxwe ye.

**Çina karker**

Hêza bıngehin lı dıji oligarşiya hevkar çina karker pêktine. Çina karker jı kedkırên mıl û seri pêktê ku ew bı derheqdest dıxebıtın û lı berkırın û lı kolanên bona pêkanina berkırınê wezifeyek bıngehin ya wan hene dıxebıtın.Lı serê salên 1980'yan nêzikê 25 jı %'an nıfûsa bıabori aktif kar-

ker ın. Çina karker hêza berkır ya bıngehin e. Rola wêye dı hundurê abori û jiyina cıvaki da zêdedıbe.Kapitalizm kolandiverê gora xwe çina karker, ya ku bêemani keda wi dıxwe bıdiveyahi bıhêzdıke.Berefbûna çina karker lı hınek navça û kargehên mezın bılezdıke.

Dendıka çina karker proleterya senayi pêktine.Nêzikê nivê karkerên senayi lı kargehên mezın dıxebıtın ku ev kargeh bıgışti lı dora pênc bajarên mezın kombûne. Komıka bıngehina bıra dın ya karkerên senayiyê lı kargehên pıçûk belabûne. Xênc hêramên senayiyên kevn, hêramên senayiyên nû dıdamezırın.Hejmara karkerên senayi lı bajarên pıçûk zêdedıbe.

Lı nav karkerên çandın û rêlê, yên ku bıserûber lı kargehek dıxebıtın bıhejmari mezındıbın. Lê nısbeta bıtemami jı axê qetyane nızm dımine, pıraniya vana karkerên demsali pêktinın.

Ciyê abori û cıvakiya bıra fıre ya personela banqa û buroyan, ya mamoste û memûrên dın yên dewletê,û ya rewşenbirên bı derheqdest dıxebıtın, hıngê dıçe nêzikê çina karker dıbe.

Çina karker ya Tırkiyê dı hundurê cıvakê da rolek jı hêza hejmara xwe pır zêde dıleyize. Lı salên 1960'an û 1970'yan tekoşina sendiqali ya çina karker jiyina cıvaki jı kur va hılda bın tesira xwe. Nemaze proletarya senayi ceribinek şera politika gırıng qezençkır, pêşengikır komên fıre ya karkeran bıkevıne tekoşina sendiqali. Gehineka yekbûna ideolojiya Marksist-Leninist û tevgera karker gavên gırıng avêt.

Lı rojên me pındama heri mezın lı pêşiya yekiti û tekoşina çina karker ideolojiya emperyalist û burcûwapaşverû ye. Jı aliyê dın reformizma burcûwa û ideolojiya burcûwa pıçûk tevgera karker jı kûr va keridıke. evana hemû dıjwardıke çina karker bısendiqali û bıpolitik xwe bıhonine.

Ça diroka bist salên axırin isbatkır çina karker çina heri şoreşger e ku dı hundurê cıvakê da dıgeşe û bıhêzdıbe. Çina karker yek çinek e dıkare bıyekkırına hemû hêzên gel yên dın lı dora tekoşina rızgariya netewi û cıvaki bıgihijine serfıraziyê û pêşengiya bışoreşgeri nûkırına cıvakê pêkbine.



**Xızanên bajaran**

Bona tekoşina çina karker qezençkırına xızanên bajaran ku ew jı gundan tên lı dora bajarên mezın komdıbın û nıkarın jı xwe ra şıxwılek berdevam bıbinın,gırıngiyek mezın nişandıke.

**Gunditi**

Gunditi dı cıvakê da lı paşiya çina karker bıra xwedanê gıraniya heri mezın e. Pıraniya mezın ya gunditiyê dı bın kedxwerına kapitalisti da roj bı roj xızandıbe û dıhırşe.Keysên dewletê tengdıbın ku bona lı gund dıjitiyên çini bı politika çandınê nermbıke. Pêkanina buhayên hılberinê, qredi û subvansiyonên çandınê hıngê dıçe zehftır bona mafên yekdestên bıci û biyani, bona mafên bazırganê mezın û xwedanên axên mezın dıxebıtın, kedxwerın û şêlandına van, pışta komên gundiyan xuzdıke. Yekdestên bıci û biyani feeliyetên xwe lı çandınê zêdedıkın.

Lı cem vi gunditi jı ber paramayina kapitalizmê, jı ber miratên feodali, jı ber kedxwerına selefkar-navdar, jı ber bıdiliti gırêdayi mayina bı qeta axên hıngê dıçe pıçûk dıbe jiyinek xızan, belengaz û reben dıdomine. Dı çandınê da bêşıxwıliya veşarti zêdedıbe.

Kapitalizm cûdabûna hundurê gunditiyê, cûdabûna navbera gundiyên bêax û xwedanên axên pıçûk û navin, gûndiyên dewlemend (burcûwaziya gund) lezdıke. Dıjitiyên çini lı der-bajaran kûrdıbın.

Lı hêramên der-bajaran bı zêdebûna kargehên senayi û çandınê ya kapitalisti, hejmara karkerên lı gund dıjin zêdedıbe. Koça gundiyên bêax û xwedanên axên pıçûk ber bı bajarên mezın zêdedıbe, evana tevdıbıne xızanên bajaran ku lı dora bajaran kombûne.

Mafên gundiyan, wana mecbûrdıke bı çina karkar bıkevıne hundurê şırıktiyê.Lı Tırkiyê tenê bı vi rêyê gunditi dıkare rolek şoreşger bıleyize.Bona serfıraziya

şoreş, peydakırına şırıktiya karker-gundi mecbûriyet e.

**Tebeqeyên navin ya bajaran, rewşenbir**

Tebeqeyên navin ya bajaran dı cıvaka Tırkiyê da ciyeki gırıng dıgrın. Kapitalizm lı hundurê vana gehineka cûdabûna çini bılezdıke. Hınek bırên tebeqeyên han dıhırşın, aliyek va ji tebeqeyên han fıredıbın. Bırên gırıng ya esnaf û zeneetkaran, ya kedkırên seri ku bı derheqdest dıxebıtın, ya memûrên dewlet teybetiyên xweyên berê bılezi wındadıkın. Jı hundurê abûqat, dıxtor û mıhendıs ku bona xwe dıxebıtın, bırek pır pıçûk bı burcûwazi va hevdıcıvın, pêşberê vi tentêla pıraniya wan dıheje.

Mecbûriyet e şırıktiya bırên fıre ya tebeqeyên navin ya bajaran bı çina karker were peydakırın.Rewşenbir ku bırek wane pıçûçık dıbıne olamkarê hêzên karbıdest, bona çina karker şırikên heri nezik ın.Rewşenbir dı tekoşina rızgariya netewi û cıvaki ya gelê me da roleki gırıng wê bıleyizın.

**Civanti**

Dı cıvaka me da civanti ciyeki teybet dıgre. Oligarşiya hevkar û hukumetên wi, lı ser civanti zordestiyên gıran bı abori û politik pêktinın,bona wi tu mandiyek erêni amadenakın. Hıngê dıçe hejmarê civanên bêşıxwıl yên xwendi û nexwendi zêdedıbe. Civanti dı tekoşina hemberê emperyalizm û paşverûti da rolek teybet û bışeref dıleyize. Civantiya welatparêz ku tımi dı tekoşinên gelê me da ciyê xwe dıgre, bona çina meye karker hevaleke şerê bıbaweri ye.

**Jın**

Kapitalizm, dawikırına perçıqandına jınan daynıne aliyek, bı talankırına keda jınan ku hıngê dıçe kaşdıbe senayi, perçıqandına han hê zêdekır. Jı aliyê dın tentêla han ev encamê dıafırinine ku jın tevbıbıne tekoşina politik û sendiqali. Bona tekoşina çina karker qezençkırına jınên



me ku jı demokratikbûna jiyina cıvaki kêra heri mezın wê bıbinın gırıngiyek mezın nişandıke.

**Gelê Kurd**

Kurdên ku dı hundurê nıfûsa Tırkiyê da bırek pır gırıng pêktinın,dı bın zordestiya bıcot da dıjin.Keda gelê Kurd ne tenê bı destê yekdestên bıci û biyani, xwedanên axên mezın, selefkar û şêlandiveran tête xwerın,jı vi ji vê da burcûwaziya Tırk lı Kurdıstana Tırkiyê zordestiyek netewi bıhoviti dıdomine.

Bendên pıhêt hene kedkırên Kurd bı kedkırên Tırk gırêdıdın. Neyarê her du gelan yek e. Çina karkerê Tırkiyê dıji zordestiyên netewi yên ser gelê Kurd derdıkeve. Tekoşina dıji emperyalizm û faşizm, û şoreşa dıjemperyalist ya gel ancax her du gel hêzên xwe yekbıkın dıkare bıgihije serfıraziyê.

**Dıjitiyên kapitalizma gırêdayi û para**

Dıjitiya ked û sermaye ku lı kapitalizmê dıjitiya bıngehin e, eva iro lı Tırkiyê bı teherê dıjitiya zêdebûyi navbera burcûwaziya mezın û yekdest, û komên gelê fıre tûjdıbe. Eva lı rex tûjbûna dıjitiyên navbera emperyalizm û gelê Tırkiyê pêşvadıçe.Dıjitiya navbera xwedanên axên mezın û unsurên dexma beriya kapitalizmê xweyidıkın, û komên gundiyên fıre, dıjitiya navbera burcûwaziya Tırk ya karbıdest û gelê Kurd, lı hundurê dıjitiyên bıngehin cidıgrın ku ev jiyina cıvaki kıfşdıkın.

Encama van hemûyan, dıjitiya tûjdıbe navbera emperyalizm û oligarşiya hevkar lı aliyekê, hemû çin, tebeqe û komıkên cıvakiyên dın lı aliyê dın derdıkeve pêş.Eva dıjitiya hane ku pêwıste bıewıli were hûrındarkırın, bona pêşvaçûna cıvaki were peydakırın û, bona hoyên hûrındarkırına dıjitiyên bıngehin navbera kedxwer û kedkıran werın peydakırın.

**Bı diroki buhurina kapitalizmê**

Hemû dıjitiyên han bıngeha buxranên cıvaki û politik lı welatê me ne.Geşbûna kapitalizmê, yekdestbûn, zêdetır gırêbûna emperyalizmê, politika nepaxkırê şer ya emperyalizma DYE, xima çini ya dewleta burcûwa tengdıke, ewi paşverûtırdıke, mılitarizmê bıhêzdıke.

Neyarên bıngehin yên gelê me emperyalizm û oligarşiya hevkar, bona mafên xweye kajo, bılındbûna tekoşina çini, tımi bı zêdekırına zordesti û êrişên xwe yên lı ser çina karker,lı ser hemû kedkır û hêzên pêşverû bersıvkırın.

Evana hemû nişandıkın pêktûne jı buxranên keys nadın ku hêzên paşverû bı azinên parlamentari karbıdestiyên xwe bıdominın.Lı aliyê dın peniya şırikti ya çina karker fıredıbe, keysên wiye tekoşinê zêdedıbe, û evana hemû eniyek netewi demokratik hım bıkeys,hım ji mecbûri dıkın.

İro Tırkiye dı bın diktatoriya terorist ya oligarşiya hevkar da dımine. Rejima faşist xulamê emperyalizma DYE ye, neyarê pıraniya gıran ya netewayê Tırk û Kurd e, û xênc dırêjkırına gehineka can wındakırına kapitalizma gırêdayi û bınısbeti paramayi lı Tırkiyê tu şıxwılek nayine ci.

Kapitalizm bıdiroki hatiye buhurin û keys tune jı ber bı rêya şoreşger,lı ser bıngeha sosyalist nûbûna cıvakê bıfılıtın.



# Rêya rızgariya netewi û cıvaki ya gelê Tırkiyê

## HIRŞANDINA DİKTATORİYA FAŞİST Û DAMEZIRANDINA DEMOKRASİYA NETEWİ

**Wezifa lez**

Wezifa heri lez ya roja me hırşandına diktatoriya faşist e. Armanca PKT dı dema han da eve ku bı hırşandına diktatoriyê azadiyên demokratik yên gışti yên gel nû va werın derbasê destkırın û fırekırın. Eva wezifa parastına aşiti, rızgarkırına Tırkiyê jı bêtarek nukleer, xılaskırına wê jı vê yekê ku bube cendırma emperyalizma DYE û peydakırına ev yekê ku lı hêram bube vejibartek aşiti, welatek karbıdest, serbıxwe. Eva, wezifa hane ku qezençkırınên cıvaki û abori yên kedkıran,memûran, gundiyan, civanan,esnafan û zeneetkaran ku hatıne talankırın, nû va werın peydakırın û fırekırın.Eva, wezifa eve ku zordestiya netewi ya lı ser gelê Kurd jı holê were rakırın.

**Rêya şoreşê**

Wezifên han,ancax çina karker lı hundurê eniya demokratik netewi hêzên aşiti û demokrasi yên heri fıre yekbıke, diktatoriya faşista oligarşiya hevkar bı lıvinên jir û serbıxwe ya komên gel were hırşandın, karin derbasbube destê eniya hêzên netewi demokratik, demokrasiya netewi were damezırandın,guhırinên dıjemperyalist demokratik destpêbıke û gori nısbeta mehkemkırına serdestiya çina karker dı çûyina gehineka han da,bı kûrbûn

û dawibûna şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel pêkheye jı bın va wenn hûrındarkırın.

PKT, wextê kıfşdıke dı geşbûna gehineka şoreşger da gav û pêpılûkên bıobjektifi mecbûri ne were banzdayin, ev wê bube sedemên bındestbûnên gıran, rastiya han ji dıbine: Şoreş gori şemayên seriyan da ne na, bıbabetiya hılberina şerên rojek yên dehmılyonan kedkır ku bona mafên xweyên kesdar dıkevıne nav û hılberina têketınên wane afırandiver û jêhati wê dıruv û teybetiyên kesdar qezençbıke.

Diktatoriya faşist gışkêva bêkeyskır şoreş bı rêya aşiti bıgihije serfıraziyê.Parlamento kalek a cunta faşist e.Vêga hıma hemû cûreyên tekoşina der parlamento lı pêşberê xwe hêzên bıçek yên dewletê dıbine.

PKT, jı xılmetkırına keysek heri pıçûk aşitiver wê para nemine, lı cem vi lı ser xima ceribên wan wê koman ronakbıke ku şoreş rêyek ne aşiti wê bışopine û parti bona hemû cûreyên tekoşinê wê tıvdarekan bıbine.PKT ku jı roja hatiye damezırandın vır va tımi bûye pêşbıra zordesti û erişên gelek bêeman, ancax bı bıhındi pêkanina tedbirên paraztına komel û kadroyên xwe dıji polêzê, dıkare lı hundurê kon an xebatên xweye berdevam peydabıke.

**Rola parti û kom**

PKT, partiya pêşeng ya çina karker, ya karkerên Tırk, Kurd û hemû gelên hındıkayiya ye.PKT dıxebıte yekitiyek heri bıhêz ya karkerên Tırk û Kurd dı yek partiyek û sendiqayan da were damezırandın,û bı prensibi lı pêşberê têketınên honandına karkeran gori jêderiya netewayê wan dısekıne.

Komunist tımi balên xwe dıdıne koman. Ewana, dı cianina wezifên hıldane pêşiya xwe da,bawerên xwe gırêdıdıne komên gel û hêza wane honandi.

Komunist tımi lı qorên heri pêşin yên tekoşinên koman cidıgrın. Ew bona doza gel jı tu mırandvaniyek para nasekının, lı paraztına mafên çina karker û mafên hemû gel, lı ronayikırına rêya tekoşina wi bıbıryari û jêhatibûna heri mezın nişandıkın. Jı mafên mırovên xebatkar cûda tu mafên teybet yên komunistan tune. Ew bona bı ideolojiki hinandın û gihiştandın, bona bılındbûna seviya komeli ya çina karker, û bona dı gehineka şoreşger da bıkarıbe rola xweye pêşengi bine ci hemû hebûnên xwe dıkıne gorin.Armanca bıngehin ya xebatên wan lı hundurê koman eve ku alikari bıkın gel bube xwedanê ceribinên politik, û bıgihije zaniyariya mecbûriyeta zıvırinên şoreşger û sosyalzmê.

Komunist lı hundurê sendiqan, kooperatifan, komelên bêşe,komelên civanan û jınan, rêbırınên van pêşverû bubın nebın lı hundurê hemû komelên komi dıxebıtın û hundurê van komelan dıbıne parezdarên pêşin yên mafên koman. Dı tevgera aşiti da bı jiri cidıgrın.Bona bırên welatparêz ya ordiyê bıkşinıne qorên gel bênavber xiret dıdominın.

**Yek eni**

PKT, bona aşiti û demokrasiya netewi, bona damezırandına yek eniya hemû hêzên netewi demokratik wê bıxebıte.Bı hev ra xebatkırına hêzên çep dı pêkanina yek eniya hemû hêzên demokratik netewi da dıkare rolek mezın bıleyize. Komunist bı şırikên xwe, lı ser bıngeha heqiya wekhevi hevkarıdıkın, bona xwe tu teybetiyek daxwezinakın.

Gori ditına PKT, rêya bıngehin ya damezırandına yek eniya hêzên netewi demokratik eve ku lı peniyê,lı hundurên şerê bı roje yekitiya lıvin ya bı milonan kedkır were peydakırın.

**Tekoşina gel**

Geşbûnên lı Tırkiyê tenê emperyalizm û oligarşiya hevkar kıfşnakın. Diroka Tırkiyê, diroka tekoşinên rızgariya netewi û çini ye ku bênavber dıdomın.

Çina karker ya Tırkiyê dı diroka xwe da, lı hoyên heri destnedayi ji pêkani komelên xweyên çini,sendiqayên xwe bıafırine û bı şerên dıjwar, bı tevgera 15-16 Pûşper



HÜSTAV

1 970,bı grevên mezın yên salên 1977-1978 û 1979-1980 gelek heqên cıvaki derbasê destê xwe kır. Ceribinên gıring qezençkır. Çina karker dı rêzek işqalkırınên kardıstanan da, dı 1 Gulan'an û lıvinên komi yên dın da, dıji êrişên bıxwin sekıni, hê ji polatır bû.

Bı tevgera dıjderketınên komi lı dıji Mıhkemên Ewlehiya Dewletê (DGM) ya neyarê gel û dıji teroristên faşist,bı grevên gışti, bı berxwedayina TARİŞ, bı lıvinên protestoyên bınav yên civanan lı dıji emperyalizma Emeriqa, bı berxwedayina gelê Kurd ku nehişt serokên MHP (Partiya Tevgera Netewaperest) bıkevıne Diyarbekır, tekoşina bona heqê jınan, bı dengdayinên şerkarên aşiti,bı wegırtınên ax yên gundiyên bêax û hındıkax, bı mıtingên berkırên pıçûk, eneneyên şoreşger demokratik yên gelê me hatın teyisandın. Oligarşiya hevkar nıkare bı tu zordesti û demogojiyek enene û potansiyela tekoşina gelê me tunebıke.

Dı dema heri tari ya paşiyą 12 Kewçerin 1980 da pêşberê hemû dıjwariyan çina karker bı berxwedayinên xwe ku nayên tunekırın baweriya komên fıre yên gel qezençdıke, dı tekoşina aşiti, serxwebûni, şıxwıl û'ax da bona wan dıbe wekok.



## DEMOKRASİYA NETEWİ

Hêzên, wextê yekbıbın dıkarın tekoşina aşiti û demokrasiya netewi bıgihijinıne serfıraziyê bıkıfştır derketıne holê.Hêzên han, jı hemû çin û tebeqeyan pêktê ku mafên wan bı oligarşiya hevkar tê hemberê hev.Komelên wan yên politik, sendiqal û bêşeyi ne. Wezifa PKT eve ku hemû hêzên han bona aşiti û demokrasiya netewi qezençbıke.

**Bıngeha çini ya demokrasiya netewi**

Demokrasiya netewi, bı hevkariya çina karker, gundiyan, esnaf û zeneetkaran, leşker, zabıtênızm û zabıtên welatparêz, rewşenbir û civanan, xwedanên kargehên pıçûk û navin,gelê Kurd, bı hevkariya hemû hêzên dıji diktatoriyê dısekının û lı dora programek yekdıbın, bı tekoşina jêhati-serbıxwe ya koman ku bı pêşengiya çina karker dıdome pêkheye were damezırandın.

Demokrasiya netewi karina van hemû çin û tebeqe-

yan e.Karina han lı dıji emperyalizm û lı dıji oligarşiya hevkar e ku dendıka wê çengek yekdest pêktinın.

**Wezîfên demokrasiya netewi**

Hukumeta hêzên netewi demokratik azadiyên politik wê peydabıke, gavên lezi bona paraztına aşiti wê bawêje,bona faşizm nû va ranebe, bona koka hetrekên leşkeriyên paşverû were kolandın, bona mılitarizm jı jiyina cıvak were derxıstın, wê derbên mıhkem lêde hêza oligarşiya hevkar û emperyalizma DYE, dewletê û hemû kolanên jiyina cıvaki wê demokratikbıke.

PKT lı dema han wê şerbıke daxweziyên hane jêrin werıne pêkanin:

## Bona aşiti, serxwebûniya netewi û dostiya navbera gelan

**Paraztına aşiti**

Para hıldana bıryarê ku bona pıştekkırına programa bıçekbûna nukleer ya NATO hatiye dayin; imzekırına peymanek ne êrişkari lı navbera Peymana Varşova û NATO, dıji xiretên fırekırına kolanên xebatkırınê ya NATO' yê; bı pıştdayina dazanina Yekitiya Sovyetan ku berpırsiyariya han hıldaye ser xwe derba ewıl ya nukleer pêknayine û lı dıji welatên lı ser axên xwe çekên nukleer xweyi nakın, çekên nukleer naemıline, jı axên me rakırına hemû depoyên nukleer; bersıva erêni dayina neytrana Komera Gel ya Bulgaristan ku armancdıke Belqana bıke hêramek bê çekên nukleer; destûr nedayina lı axên Tırkiyê roketên atom yên Emeriqa were cikırın;

**Lı hêram aşiti û dostiya navbera gelan**

Derketına dıji wê yekê ku "Hêzên Çeleng" ya DYE lı ser axên me werın cikırınê, dawikırına plan û pêkaninên fırekırına wergehan, sıtarnekırına balafırên AWACS'ên cesûsi lı ser axên me; derketına dıji têketınan ku lı hêram bloqên leşkeri yên êrişkar yên nû werın damezırandın;

Kutakırına nehevhatına Tırk Unan bı tevnekırına NATO, û lı ser bıngeha wekheviya heq ya her du welatê, lı ser bıngeha hıqûq û pêkaninên navnetewani,nasnekırına Plana Rogers ku Behra Ege û kolanên wê yên fırinê dıde bın karbıdestiya NATO û DYE;

Cianina sozên Tırkiye ku dı sala 1974'ê da eşkerekırıbû leşker jı Qıbris'ê wê werın para kışandın, jı hemû leşkerên biyani pakkırına Qıbris'ê, naskırına prensibên serxwebûni, yekiti û karbıdestiya gıravê, hûrındarkırına pırsiyara Qıbris bergeha bıbırati jiyina cıvatên Tırk û Urımên gıravê;

Gırêdayina peymanên ne êrişi ya bıhemberi bı hemû welatên cinar;

Lı Rojhılatanavin pışgıri bı hemû hêzên dıjemperyalist, berê pêşin bı gelê Fılistin û KRF (Komela Rızgariya Fılistin), paraztına heqa gela Fılistin ku dewleta xwe bıdamezırine,paraderketına İsrail jı axên wegırtye;

**Karbıdestiya netewi**

Qelışandına "Peymana Hevkari ya Paraztınê" ku cunta bıryarkırye û hemû peymanên dilitiyê bı DYE hatıne imzekırın ku ew bı karbıdestiya meye netewi va hevidû nagırın, bışkaftına wergehên Emeriqa û NATO jı axên me;

Jı ambargoya çek ya Emeriqa bı derxıstına encamên pêwist, peydakırına paraztına meye netewi bı pêvendiyên pır bıali,bı bıngehkırına hêza me bıxwe,bı bêpındamkırına geşbûna abori, ne gori doktrinên leşkeri yên Emeriqa, gori mafên netewi nû va sazkırına politika ewlehiya netewi;

**Bıaşiti lı cem hev jiyin**

Pêkanina gavan lı bergehê bêbloqi;

Prensibên bıaşiti lı cem hev jiyin wek, wekheviyên bıhemberi gıramgıri lı pêşiya karbıdesti û yekitiya axan, tevnebûna şıxwılên hundur, hûrındarkırına nehevhatınan bêxılmetkırına

zordesti û gefên zordesti kırına bıngeha politika der;

Lı hêram dameziranduna cinartiya baş û hevkariya karên bıhemberi peydadıke bı hemû welatan;

## Bona nû va qezeçkırın û fırekırına heq û azadiyên demokratik

**Effûya politik a gışti**

Derxıstına effûya politik a gışti,dawikırına qoxuşturman û gırtınan, rakırına siza dardakırınê; paradayina heqên welatiyê yên koçerên politik û bona van naskırına heqa bıazadi zıvırina welat;

jı holê rakırına zagûnabıngehina parêzdarê 12 Kewçerin û amadekırına zagûnabıngehinek xwedanê babetiyên netewi demokratik lı ser bıngeha demokratik ya zagûnabıngehina 1961; peydakırına vê yekê ku hemû welati bıjêhati û demokratiki tevbıbıne amadekırına zagûnabıngehin û zagûnabıngehin derbaskırına holê bı referandûmek ku lı hoyên azadi were pêkanin;

**Zagûnabıngehina netewi demokratik**

Bı vi zagûnabıngehinê:

- Derbasbûna hemû karin parlamentoyê ku lı hoyên demokratik were damezırandın, û hisabdayina hukumetê tıkûtenê lı ber parlamentoyê, ancax bı bıryara parlamentoyê jı wezifê hıldana hukumetê; ecıbandına sistema hılbıjartına bınısbi lı ser bıngeha prensiba keysbıdın reyên gel bı teherek wekhewi bıteyise parlamentoyê; bona 18 saliyan naskırına heqa jıbartınê,bona 21 saliyan naskırına heqa hılbıjarbûne;
- Damezırandına rêbırınên hêrami bı hılbıjartınan, zêdekırına yetkiyên wan, û fırekırına keysên wane dıravi;
- Rabûna qedexeyên lı ser partiyên politik PKT ji lı nav, dawibûna hemû cûreyên tevbûnên dıjdemokratik yên lı ser partiyan, sendiqayan, dernekan ku ev bı navê qontrola dewlet têtê pêkanin;
- Bêkêmi naskırına heqa grev, peymana komi û bısendiqabûna azad bona hemû xebatkaran;
- Peydakırına azadiyên xwe honandın,çapkırın,lıvin pêkanin û ponıjin, lı ser tu keseki jı sedemê baweriyên dini û vicdani pêkneanina zordesti;
- Peydakırına serxwebûniya datkırınê,otonomiya TRT û universitan;
- Jı holê rakırına hemû zagûnên dıjdemokratikên kevn û nû, weka DGM, Tentêla Nehiniti ûhd. berê pêşin 141-142, qedexekırına partiyên faşist, nejadperest û parêzdarê şer;
- Dawikırına zordestiyên netewi lı ser gelê Kurd;

**Demokratikkırına dewletê**

- Paqışkırına dezgeha dewlet,nemaze ordi jı faşistan, jı kavılên cunta, jı vana pırskırına hisabên sosretên ku dıji gel pêkanine;
- Dawikırına rewşa han ku avagehên weka Mıllı Guvenlik Kurulu (Diwana Ewlehiya Netewi) û MİT (Komela İstıxbarata Netewi) lı hundurê dewletê dewletek dın ın, qetandına hemû bendên van avagehan bı CİA û servisên nepeniyên emperyalistên dın, û nû va honandına avagehên ewlehiyê lı ser bıngeha demokratik;
- Pêkanina hemû tedbiran ku demokrasiya netewi bıkarıbe xwe lı dıji hemû cûre êrişên emperyalist û neyarê şoreş bıparêze;
- Bıwezifekırına ordi bı wezifên paraztına serxwebûni û qezençkırınên demokratik; demokratikkırına jiyina hundurê ordi; rakırına pêkaninên weka xılmetkırına zordesti û lêdan;
- Zıvırandına memûrên dewlet û endamên hinandınê ya universitan ser şıxwılên xwe ku paşiya 12 Kewçerin jı sedemên politik jı şıxwılên xwe hatıne dûrkırın;





TÜSTAV

## Dıji gırêbûniya abori û bahatiyê bona aboriyek netewi kêra gel

**Guhırin dı politika abori da**

- Jı bın va guhırandına politika abori ku dewlet şopdıke; dawikırına bıryarên 24 Berfbarinapaşin û pêkaninên wane cûre cûre ku bıryarên han barên buxranê dıde ser pışta kedkıran,û gırêdayibûna bıabori zêdedıke ku welatên emperyalist dıdın sıpartın;

- Tekoşina hemberê bêşıxwıli kırına armanca cıvaki ya bıngehin dı politika abori da, pêkanina programên teybet bona hındıkkırına bêşxwıli;

**Bergehbûna serxwebûniya abori**

- Şûna pêvendiyên abori yên ne wekhev bı welatên emperyalist, damezırandına pêvendiyên abori yên lı ser bıngeha bıkêrbûna bıhemberi û wekhevi bı hemû welatan; bona pêkaninên hevcedariyên finansmanên der ya aboriyê ji şopkırına evê rêyê; dawibûna gırêdayibûna bı avagehên kolonyalistên-nû weka İMF û Banqa Cihanê; pıştekkırına tekoşina Sazûmanek Aboriya Navnetewaniya Nû ku dı piva cihanê da tête domandın;

- Rakırına hemû teybetiyên bona sermaya biyani hatiye naskırın; paraztına bazara hundur lı dıji sermaya biyani; tımi zêdekırına rola dewlet dı itxalat û ixracatê da;

**Reforma demokratik ya ax û çandınê**

- Pêkanina reformek demokratik ya ax û çandınê; belakırına axên xwedanê axên mezın bı destê komitên gundiyan, bona gundiyên bêax û xızan; modernkırına çandınê; bıerzani û bı faizên nızm peydakırına qredi,peyin, derman, tov û navginên çandın bona kargehên gundi, lı hemû kolanan, jı berkırın heya malên têne kırin,heya fırotınê pıştekkırına tevgera xwe lı ser bıngeha bıdıli dı kooperatifan da honandınê; zêdekırına rola kargehên dewlet lı çandınê; Kıfşkırına buhayên peni ya hıberinan lı seviyeki keda gundiyan bersıvdıke;

**Tengkırına lıvinên yekdestan tunekırına şêlandiveri**

- Dawikırına emılandına kargeh û avagehên abori ya dewletê bona mafên yekdestên kapitalistên teybet û şêlandiver; sekınandına edandınên jı bûtça dewlet ku bın navê "teşwıq", "muafiyeta bacê" , "iada bacê" dıgihijınıne holdingan, û bergehkırına fonên han bıhêzkırına kargehên dewlet;

- Kêmkırına xerçkırınên gıran ya bıçêkbûne; bıhejmari kêmkırına ordiyê ku Tırkiye dı NATO'yê da ordiya bıhejmari dudan xweyidıke, berjêrkırına ordi ew qasê ku têra paraztına meye netewi bıke; kurtkırına dırêjiya leşkeri;

- Derbaskırına dewlemendiyên sererd û bınerd lı bın xwedaniya dewlet; peydakırına vê yekê ku karker bıdemokratiki tevbıbıne rêbırınên kargehên dewlet û kargehên mezın yên kapitalist;

- Hıldana buhayan bın qontrolê; paraztına qedandiveran; pındamkırına şêlandiveri; pêkanina tedbiran ku kedkırên têkıliyen wan bı qrediyan hene, xwedanê kargehên pıçûk û navin dıparêze; bın qontrola dewlet dayina fonên dıravi xızmeta geşbûna netewi ku lı banqan kombûne;

- Pındamkırına qaçaxçitiya bacê; pêkanina reforma baca datnas ku lı ser bıngeha prensiba jı kesên pır qezencdıkın pır, jı kesên hındık qezencdıkın hındık bube, bacên bıwesite hındıkbıke ku ev barbûne ser pışta komên kedkır û bona qedandınên luks bacên pêwısti bine;

**Bısenayibûn**

- Şopkırına politikayek geşbûna bıplan ku lı abor,lı senayi û çandın serxwebûna abori wê peydabıke, xırabiyên avayi û newekheviyên kûr yên hêrami wê jı holê rake, berê hemû tıştan bı destê dewlet damezırandına van sektoran ku dı senayi da dinamık ın û bı encamên şoreşazanisti û tekni-

TÜSTAV

ki gırêdayi nın, û seferberkırına hemû hêzên bona afırandına teknolojiya modern; peydakırına geşbûna bıhevhati ya senayi û çandın; ecıbandına prensiba xılmetkırına têzanên enerji yên welat;

- Paraztına kargehên teybet ku tevdıbıne bısenayibûna welat û bıhêzbûna bıngehên serxwebûniya abori, pıştekkırına kargehên pıçûk û navin ku ew dı pêşiya dıjwariyan da ne, paraztına esnaf û zeneetkarên pıçûk û peydakırına keysan ku evana hê jêhatitır tevbıbıne aboriyê;

**Bona çina karker** - Her sal kıfşkırına derheqdesta heri hıdık bı teherê ku gori seviya jiyinek mırovati,bona hemû hêram û çıqên şıxwılan wekhev, bı tevbûna demokratiki ya karkeran, û der bacê gırtına derheqdesta heri hındık; zêdekırına maaş û derheqdestan ku peydabıke hêza kırinê lı seviya jiyinek mırovati bımine; peydakırına heftiya şıxwıl ya 40 seetê û dı şıxwılên gıran da roja şıxwıl ya 6 seetan; nemayina karkerên bêsigorte; guhırandına Zagûna Şıxwıl dı bergehê paraztına heqên kedê ku ev karkerên çandın û rêlê ji hılde hundurê xwe; damezırandına sigorta bêşıxwıliyê; zûtırki pêkanina tedbiran ku qezayên şıxwıl were pındamkırın, sıhheta xebatê were paraztın;

**Bona gunditi** - Pekanina tedbirên pêwısti ku gund û gundi jı paramayi, jı xızani were rızgarkırın; gihiştandına gundan alektrik, av,rê,olamên bıjun; damezırandına dıbıstan û xanên çande; pıştekkırına damezırandına tesisên senayi lı gundan; pêkanina heqa sigortayên bıjun û kaliyê bona gundiyan; pıştekkırına gundiyan dı avakırına xaniyan da;

**Bona civanti** - Bona civanti mandiyek bıewlehi, hinandınek hevdem-demokratik û şıxwıl; nû va sazkırına hemû seviyeyên sistema hinandın, bı cûreki demokratiki û bıngehin, gori pêwıstiyên geşbûna bı abori, cıvaki û zanista hevdem; pêkanina heqa hinandın bona hemû kesan; hûrındarkırına pırsiyarên burs û warê (yurt) bona xwendevanan; pêkanina planêkırınek ku bona hemû civanên hinandna navin, xwendegeha bêşe û xwendegeha bılınd kutakırıne şıxwıl peydabıke; paraztına civanan lı dıji edetên xırab weka emılandına dermanên tevızandınê, alkolizm, pornografi û peydakırına keysan ku ew bıkarıbın wextên xweyên vala bıhêjabıkın; pêkanina hinandına bêşeyi û gıştiya şagırt,çırax û karkerên civan bı ne wındakırına derheqdest lı hundurê seetên xebatê;

**Bona jınan** - Bona paraztına jınên xebatkar pêkanina prensibên bona şıxwıla wekhev, derheqdesta wekhev û wekheviya fersend lı şıxwıl ditın û terfibılındbûnê; paraztına dayêkayiyê bı destê cıvak û dewlet; vekırına qreşan;

**Bıjun** - Peydakırına bê derheqdest xweyikırına kedkıran; geşkırına bıjişkiya pındamkır; olamên bıjun bırına gundan; modernkırın û lı welat belakırına nexweşgehan;

**Ewlehiya sosyal** - Damezırandına sistemek hevdem bona ewlehiya sosyal; peydakırına qontrola demokratik lı avagehên sigorta bı destê endamên sigortayan; paraztına kesên teqavut, bi,bêkes û seqetan;

**Xani û bıbajarbûn** - Qontrolkırına kırêyan; damezırandına xani bona dewletê kırına wezifa bıngeh yek; peydakırına xaniyên bıbıjuni, mehkem bı kırêyên erzan bona kedkıran; geşkırına kooperatifên xani damezırandıne; çêkırın û pêkanina planên bıbajarbûna modern ku dorhêl dıpareze; hûrındarkırına pırsiyara qanalizasyon;

TÜSTAV

**Zanist,çande,pişi** - Paraztına zanist, çande û pişi lı dıji xırabkırınên emperyalist, şoven û ne exlaqi; pıştekkırına zanist çande û pişi bı destê dewlet ku babetiyên wane hevdem,mırovparêz,netewi û demokratik werıne bıhêzkırınê;

**Karkerên lı der welat** - Pêkanina peymanan ku tentêla bızagûni ya karkerên lı der welat hıldıdıne bın misagerê, û bona van hemû heqên cıvaki, abori û demokratik nasdıkın ku karkerên welatên tê da dıjin xwedanên wan ın; domandına tekoşinek jir lı dıji politikayên hınek hukumetan ku bergehbûne vegerina axırin bı zorê bısıpartın; peydakırına keysên cibûn û şıxwılditın bona karkerên vegerina axırin pêkanine; paraztına tesaruf û razandınên wan lı dıji yekdestan û vana bergehkırına geşbûna netewi bı pêşengiya dewlet; dawikırına zordestiyên politik ku bı destê konsolosiyan tête domandın, rakırına xeracan ku bın navê xerç, mesref têne berefkırın, dawikırına şêlandına bın navê leşkeriya bıbedel; pêkanina planek geşbûne ku bıkanbe koçkırına dervayê welat jı holê rake.

***

Partiya Komunist ya Tırkıyê bawerdıke programa han dıkare bona yekitiya eni û lıvina ya hemû hêzên netewi demokratik bube bıngeh. Beramberê vi PKT dıkare bı hêzên dıji-cunta ku ew programa demokrasiya netewi gışkêva naecibinın, bona hırşandına cunta,bona afırandına hoyên ku gel bıkanbe wêna xwe bıazadi nişanbıke hevkari pêkbine.



# TEMAMKIRINA ŞOREŞA DIJEMPERYALİST DEMOKRATİK YA GEL

**Destpek û temamkırına şoreşe** Yekbûna hêzên dıji faşizm, jêhati derbasê lıvinêbûna komên gel, û hırşandına diktatoriya faşist rêya şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel wê veke. Derbasbûna karinê jı oligarşiya hevkar destê hêzên netewi demokratik, damezırandına demokrasiya netewi, pêkanina guhırandınên lı jor hatıne jımartın, pêpılûka ewıl ya şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel e. Her çıqas beramberê şırikên wê ci û serdestiya çina karker lı hemû avagehên karinê zexmbube,ev qas demokrasiya netewi wê bızvıre karina gel, bergehbube ser temamkırına wezifên şoreşa dıjemperyalist demokrarik ya gel.

Wezifên şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel, hêzên yekbûyi yên hemû gel bı pêşengiya çina karker, lı ser bıngeha şırıktiya karker-gundi dıkarın temambıkın. Çina karker bı hêzên dın ji ku ew pêpılûka damezırandına demokrasiya netewi bı wan hevkari pêkanibû, çıqas ev nêzikbıbıne hûrındarkırına wezifên nû wê hevkariyê bıdomine.

**Guhırinên şoreşger** Dı dema temamkırına şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel da: Serxwebûna netewi wê were zexmkırın, hemû bendên bı NATO wê werın qetandın, peymanên ne wekhev ku bı CAA hatıne pêkanin wê werın iptalkırın.

Şırketên burcûwaziya mezın û yekdest, û yên şırke-



FÜSTAV

tên biyani ku bona aboriya netewi gırıng ın, banqe, sigorte, bazırganiya der û bazırganiya mezın ya hundur wê bıkevın bın xwedaniya dewlet

Bı pıştekkırına mılkên kooperatifi û bı bıhêzkırına kargehên dewlet, reforma demokratik ya ax û çandınê awqas were zexmkırın ku êdi jê qe neyê para zıvırin.

Pêkanina aboriya bıplan wê were destpêkırın.

Jiyina politik û bıgışti hemû jiyina cıvat,jı bın va wê were demokratikkırın,wê were pêkanin kedkır lı hemû kolanên jiyinê tevbubıne rêbırınê û qontrola demokratik ya karkeran wê were fırekırın. Karina gel bona paraztına qezençkırınên şoreşê tedbirên pêwısti wê bine ci.

Şoreşa çande wê were destpêkırın.

**Hûrındarkırına pırsiyara netewi**

Karina gel pırsiyara netewi wê hûrındarbıke. Heqa qedera xwe bı destê xwe kıfşkırına netewayê Kurd, ango heqa cıhêbûnê wê were peydakırın.

Ger gelê Kurd bı wêna xweye azad bıryarbıde,bı berambere gelê Tırk bımine, dewleta hevkar bı cûreki gori hoyên dirokiyên kesdar wê were sazkırın. Bı zagûnabıngehina dewleta demokratik heqa cıhêbûne ya gelê Kurd dı bın misagerê da bımine.

Komunist tımi parezdarê dewletek merkezi û demokratik ın ku ev lı ser bıngeha bıdıliti bube. Komunist wextê pırsiyara netewi hıdıdıne pêşiya xwe, mafên çina karker û sosyalizmê lı pêşiya hemû tıştan dıgrın.



## ARMANCA MEYE SOSYALİST

Damezırandına sosyalizm û jı wır derbasbûna komunizmê ku lı ser ala wi prensiba "jı hemû kesan qasê.hunerên wi, bona hemû kesan qasê hevcedariyên wi" cidıgre, armanca dûr ya Partiya Komunist ya Tırkiyê ye.

**Şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel mezınbûna şoreşa sosyalist**

Dı gehineka şoreşa gışki ya bı du pêpılûk da, şoreşa demokratik bı derbasbûna jı gelek pêlekanên navin wê rê veke sosyalizmê. Bı kûrbûna gehineka şoreşger ku bı demokrasiya netewi wê destpebıke, derbasê nav hevdu bûna wezifên şoreşa dıjemperyalist demokratik ya gel ku temamdıbın bı wezifên sosyalist, pêpılûka sosyalist ya şoreşê wê destpêbıke.

Hêza pêşeng û pêşvabır ya şoreşa sosyalist çina karker e ku bı gundiyên kedkır û bı kedkırên bajaran şırikti dıdamezırine.Ç ina karker wê bıxebıte hêzên ku lı beriya derbasbûna sosyalizm bı wan hevkari pêkanibû qezençbıke tekoşina armanca sosyalist û bı wan hevkariya xwe bıdomine.

**Diktatoriya proletarya**

Şûna dezgehê dewleta burcûwa ku lı dema hemû geşbûna gehineka şoreşa gışki ya bı du pêpılûk da tête



TÜSTAV

qet qeti kırın û tunekırın, karina bıhêz ya çina karker, diktatoriya proleteya wê cibıgre. Ev sazûmana cıvaki ya nû lı ser bıngehên karina çina karker û xwedaniya cıvaki lı ser navginên berkırınê, wê rûne demokrasiya rasti ye.

**Sosyalizm**

Bona bı fıili komên gelê fıre tevbıbıne rêbırına cıvak,afırandına hoyên pêwıst bona dosti û wekheviya gelan, bona kêra gel,bıplan û bêbuxran geşbûna abori, hıldana bın misager heqên cıvaki û politik ya gela kedkır tıkûtenê sosyalizm dıkare peydabıke.

Xwedaniya sosyalist wê bube bıngeh ku berkırın bıplan were honandın û kedkırên seri û mıl bıjêhati tevbıbıne bergehkırına aboriyê.Ahaki dı sosyalizmê da zanist bıkeve kolanên cıvaki û abori yên cûre cûre, afırandınên hemû potansiyelên şoreşa zanisti û tekniki bona lezkırına geşbûna abori û bona bersıvkırına hemû hevcedariyên endamên cıvak gışkê va û bıfıreyi were xılmetkırın. Şoreşa çande wê bıgihije encamê,hemû hêjayiyên çandeyi wê bıgihijıne komên heri fıre. Hêjayiyên mırovparêz û bıexlaqi wê bıbın karbıdest.

Ahaki wê pêkwere hemû cûreyên keda mırovê bı aliyê mırovê dın were xwerın û cûreyên newekheviyên netewi heta hetaye were tunekırın.

Damezırin û geşkırına sosyalizm wê xwe bısıpêre pıştekên tevbûn û têketınên komên heri fıre ku ew bı aliyê çina karker têne rêbırın û ronakkırın. Partiya Komunist gışke va pêşenga cıvaka sosyalist e.Bı politik jêhatibûna gela kedkır û komelên komi ku zêdedıbe, zêdekırına heqên mırovan û bıpırali geşkırına demokrasiya sosyalist, yekitiya lıvin û wêni ya gel wê pêşvabıbe.

Dı sosyalizmê da lı hoyên jı holê rakırına çinên kedxwer, bızêdebûyi hevgırtına çinên kedkır, geşbûn û bıhezbûna saziya sosyalizmê, diktatoriya proletarya wê bızvıre dewleta hemû gel, û demokrasi hê ji geşbıbe û wê derkeve seviyek bılındtır.



***

Gelê Tırkiyê ancax derbasê jiyinê kırına programa han dıkare bıgihije sazûmana cıvakek bêzordesti û bêkedxwerın ku bı sedsalane kovanê wi dıkşine.Şadi û bextewariya gel ancax bı rêya han pêkheye were peydakırın û tımi were geşkırın.

Partiya Komunist ya Tırkiyê û hemû komunist bona pêkanina programa han, jı tu mırandvaniyek wê para nemının, hemû hêzên xwe dı rêya tekoşina ev armanca serbılınd wê bikıne gorin.

TÜSTAV

Programm der Kommunistischen Partei der Türkei, verabschiedet von dem V. Kongreß der KPdT 1983 (kurdisch)

Türkiye Komünist Partisinin 1983 yılında V. Kongresinde kabul edilen programı (Kürtçe)